PARTÎYA DEMOKRATÎK A GELAN

BULTENA ÇANDINIYÊ YA HDP'Ê

GULAN 2020 / HEJMAR:04

# KARKERÊN ÇANDİNİYÊ YÊN DEMSALÎ

*Karkerên çandiniyê yên demsalî, mirov wiha wan dikare bidin danasîn: **" Ew karkerên ku di ziviyên xwe yan jî di zeviyên hinekan de karên dermankirin, eşêfkirin, çandin û wekî karker hilberîna berhemên çandiniyê dikin û heqdestên xwe bi rengekî rojane digirin. Ev karkerên ku bi heqdestên rojane dixebitin hinek bi peymanên kar û hinek bê peymanên kar, hinek hemwelatî û hinek jî penaber û koçberên ji welatên din in."***

*Li Tirkiyeyê karkeriya demsalî divê mirov ji alî bingeha sosyo-ekonomik, şert û mercên jiyan û xebatê, xizanî û tunebûnê de ji hemû aliyan de bigire dest.*

*Divê mirov rewşa sektora kedê û hêza kar ya heyî ji alî aborî, siyasî, civakî û rewşa piyaseyê li ber çavan bigire.*

*Karkerên çandiniyê yên demsalî her sal li Tirkiyeyê bi destpêka meha adarê re herî zêde ji Amedê, Mêrdîn, Êlih û Ruhayê berê xwe didin Adana û Mêrsinê (ji bo danheva sebze û porteqalên serayan). Li Afyonê (gilyaz), li Ordu, Duzce û Giresunê danheva (findiqan), li Rizeyê (danhev û berhevkirina çayê), Li Konya û Aksarayê (pincar, garis û dendikê gulên berberoj), li Samsunê (karên sebzeyan) her wiha li derdora 50 bajaran heta meha mijdarê karkerên demsalî li gelek qadên çandiniyê dixebitin.*

*Piraniya Karkerên çandiniyê yên demsalî bê ewlekariya tenduristî tên xebitandin û hejmara wan karkerên k udi van mercan de nayê zanîn lê li gorî anketeke (TÜİK) û li gorî encamên vê rapirsînê ên adara 2018'an 4 milyon û 983 Karker hene. Her wiha di sala 2017 an de 5 milyon û 36 hezar karker hebûn. Ji van karkeran ji sedî %81,2 bê ewlehiya denduristî dixebitin, herî kêm ji sedî % 40'ê wan Karkerên çandiniyê yên demsalî ne. Li gorî wê yekê mirov dikare bêje ku li Tirkiyeyê derdora 2 milyon Karkerên çandiniyê yên demsalî hene.*

*Ji berk u zevî û erdê Karkerên çandiniyê yên demsalî tune ye lewre jî dezavantajên wan ên aborî tune ne, her wiha çûn û hatina bi ewle, binesazî, ewlekariya tenduristî û ewlehiya karê wan jî tune ne û jig elek maf û heqên xwe bêpar in. Lewre jî em dibînin ku ew her li karekî din digerin.*

*Karkerên çandî ya demsalî di nav Qanûna Kar a Tirk a bi hejmara 4857 de cih nagirin. Qanûna Deynan bi ne sererastkirina têkiliya navbera karkerên çandinî ya demsalî û kardêr a ji aliyê otoriteya fermî ve, bi xebatandina bêpeyman dereng dixe. Di nav hemû karkerên çandinî ya biheq de, karkerên çandinî ya demsalî bêyî bûyîna ewlehiya civakî di şert û mercên herî dezavantaj de dijîn û dixebitin.*

## KARKERÊN ÇANDİNİYÊ YÊN DEMSALÎ Jİ NEÇAR HİŞTİNE KU BÊYÎ EWLEHİYA TENDURISTÎ BİXEBİTİN.

✤ Karkerên çandiniyê yên demsalî dema bi wesayitan tên veguhestin ji bo cihên lê kar bikin gelekî zêdeyî kabasîteya wan wesayitan siwar dikin û piraniya wan berdêla wê rêwîtiyê jî ji kîsî xwe didin.

✤ Her sal di dema veguhestina Karkerên çandiniyê yên demsalî qezayên trafîkê diqewimin û gelek ji wan di encamê de jiyana xwe ji dest didin. Li gorî daneyên rêxistina xebatê ya navnetewî (ILO) her sal ji 335 hezar mirinên karkeran ên di encama qezayan de ji wan 170 hezar Karkerên çandiniyê ne.

## EW NE QEZA NE, LÊ CİNAYET Û KUŞTİNİN! TEVÎ KU HER SAL KARKERÊN ÇANDİNİYÊ YÊN DEMSALÎ Dİ RÊ DE DİMİRİM LÊ Jİ BO TEDBÎRÊN PÊŞÎGIRTİNA VÊ YEKÊ TU GAV Jİ ALÎ HİKÛMETA AKP VE NAYÊN AVÊTİN.

Li Manîsayê di encama qezaya ku tankerek li kamyoneta Karkerên çandiniyê yên demsalî qelibî de 15 karkeran jiyana xwe ji dest dabû. Di nava şeş mehên pêşîn ên sala 2015'an de karker di rêwîtiyan de jiyana xwe ji dest dan.



***Wêne: bianet.org***

✤ Şert û mercên xebata Karkerên çandiniyê yên demsalî ne şert û mercên mirovî ne, cihên wan ên bêhvedanê (bi piranî çadir û konteyner in), cihê xwarinê, cihên avrêjê û ava paqij a vexwarinê gelekî kêm in.

✤ Karkerên çandiniyê yên demsalî derdora ji sedî %80'yî di çadiran de dijîn.

✤ cihên ku Karkerên çandiniyê yên demsalî lê dijîn ji bo bapêş û belavbûna nexweşiyan vekirî ye û ji berk u piranî bê ewlekariya tenduristî ne, şert mercên dermankirinê jî tune ne.


✤ Gelek nexweşî li Karkerên çandiniyê yên demsalî peyda dibin, wekî : enfekisyona zoonotik, nexweşiyên kezebê, nexweşiyên çermî, nexweşiyên çemî yên ji ber bikaranîna madeyên kîmyewî û nexweşiyên ji ber mana zêde ya li ber tavê.

## "KARKERİYA ÇANDİNİYÊ YA DEMSALÎ BÊ RÊXİSTİNBÛNE!"

✤ Hema bêje tu tevdîr ji bo tenduristî û ewlekariya Karkerên çandiniyê yên demsalî nayên girtin.

✤ Karkerên çandiniyê yên demsalî rojê derdora 10-11 seatan dixebitin.

✤ ji ber ku tu mîkanîzmayek ji bo parastina mafên Karkerên çandiniyê yên demsalî tune ye piraniya wan bi heqdestên gelekî kêm dixebitin.



HATAY ZİRAAT ODALARI İL KOORDİNASYON KURULU KARARI

2020 pamuk çapa yevmiye işçi ücretleri tavsiye niteliğinde uzlaştırıcı karar tespit etmek üzere Hatay Ziraat Odaları İl Koordinasyon Kurulu 28.05.2020 Perşembe günü saat 11:00'de Kırıkhan Ziraat Odasında toplanarak aşağıdaki kararlar alınmıştır.

1. 28.05.2020 tarih...n itibaren bölgemizde çal...lacak tarım işçilerimize yaş ve cinsiyet ayrımı yapılmaksızın amele 52.00TL aracı(elçi)'lere 4.00TL ödenmesine; toplam 56.00TL
2. İşçiye ayrıca yem... parası verilmemesine.
3. Pamuk çapalama işlerinde 14 yaşından küçük olmamaları ve çalışamayacak kadar yaşlıların ve hastaların çalıştırılmamasına.
4. Tarım işçilerinin örf ve adete uygun olarak sabah saat 06:30 'da işe başlamaları ve akşam 16:30 da işi bırakmaları, çalışma süresi içerisinde 09:00-09:30 arası 30 dakika dinlenme molası,13:00-14:00 arası bir saat yemek molası vermesi ve dinlenme molası istirahat saatlerinin değiştirilmemesi ve istirahat saatlerinde kesinlikle çalışma yapılmaması
5. Bu konular içerisinde yer almayan ...lli teamüle göre ziraat odalarınca çözülmesine
6. Günlük çalışma ücretleri saat başı 7.00TL olarak belirlenmiştir
7. 16:30 dan önce iş bırakılırsa saat baş 7.00TL düşülecektir.

Yıllardır süre gelen geleneklerimize uygun olarak hazırlanan bu tavsiye niteliğinde alınan karar oy çoğunluğu ile tarafımızdan okunarak imza altına alınmıştır.

Selahattin YALMAN
HATAY ZİRAAT ODALARI İL KOORDİNASYON KURULU BAŞKANI

MEHMET MUZAFFER ...
HATAY İL ZİR.OD. KOORDİNASYON BŞK.YRD

MEHMET ...K
HATAY İL ZİR.OD. KOORDİNASYON SEKRETERİ

AHMET KESKİN
ERZİN ZİRAAT ODASI BAŞKANI

MEHMET ALİ BALLI
YAYLADAĞI ZİRAAT ODASI BAŞKANI

BAYAR EKER
KUMLU ZİRAAT ODASI BAŞKANI BAŞKANI

Sabahaddin BAYIR
ALTINÖZÜ ZİRAAT ODASI BŞK

Mehmet ŞAHİNER
HASSA ZİRAAT ODASI BŞK

Selim KAMACI
SAMANDAĞI ZİRAAT ODASI BAŞKANI

Şemseddin GÜNEYDİOĞLU
REYHANLI ZİRAAT ODASI BAŞKANI

İbrahim SEYHAN
DÖRTYOL ZİRAAT ODASI BAŞKANI

Bünyamin NAL
ARSUZ ZİRAAT ODASI BAŞKANI

Sedat DURAN
DEFNE ZİRAAT ODASI BAŞKANI

✤ Malbatên xizan ên karkeriya çandiniyê ya demsalî dikin di bin sînorên xizaniyên de jiyana xwe derbas dikin.

✤ Tevî madeya bi hejmara 4857'an a qanûna Karkeriya çandiniyê ya demsalî jî tu ewlekariya Karkeriya çandiniyê ya demsalî tune ye.

✤ Rêjeya mirinên ji ber dema zayînê din ava karkerên çandiniyê yên demsalî de 5 caran ji rêjeya giştî a mirinên bi vî rengî ên vî welatî zêdetire.

## "KARKERİYA ÇANDIİNİYÊ YA DEMSALÎ MÊTİNGERİYA KEDÊ YE!"

✤ Karkerên çandiniyê yên demsalî li cihên ku karkeriyê lê dikin ji ber ku ew bi xwe meseleyên hewcedariya elektrîkê bi cih dikin di bikaranîna wê de ewlekarî tune ye.

✤ Ji ber ku piraniya Karkerên çandiniyê yên demsalî kurd in di vê atmosfera bilindbûna asta nijadperestiyê li gelek deveran rastî êrîşên nîjadperest tên.

***Lİ NAVÇEYA TERME YA SAMSUNÊ Lİ TAXA BAFRACALI KARKERÊN ÇANDİNİYÊ YÊN DEMSALÎ RASTÎ ÊRÎŞA NİJADPERESTÎ HATİN Û Dİ ENCAMÊ KARKEREKE Bİ NAVÊ PERÎHAN AKİN JÎYANA XWE Jİ DEST DA.***




***HER WIHA ŞIRIN TOSUN A K UDI 21 TEBAXA 2019'AN DE JI AMEDÊ JI BO KAR ÇÛBÛ SAKARYAYÊ DI ENCAMA ÊRÎŞEKE ÇEKDARÎ DE BIRÎNDAR BÛBÛ Û DI MEHA COTMEHÊ DE LI NEXWEŞXANEYÊ JIYANA XWE JI DEST DABÛ.***




***Dİ NAVA PERGALA HİQÛQÊ DE TU SERERASTKİRİNÊN QANÛNÎ ÊN DERBARÊ ŞERT Û MERCÊN JÎYANA KARKERÊN ÇANDİNİYÊ YÊN DEMSALÎ TUNE YE.!***

## DI KARKERIYA ÇANDINÎ YA DEMSALÎ DE ZAROKBÛYÎN

✤ Di qadên xebatê ya çandiniyê de ji ber ku koçberiyeke malbatî pêk tê zarok jî ji neçarî di zeviyan de dixebitin.

✤ Li gorî texmînên ILO'yê li cîhanê di navbera 5-14 saliyan de 250 milyon zarok bi awayekî aktîf di qadên aboriyê de dixebitin û ji wan ji sedî 30 zarok di karê çandiniyê de dixebitin.

✤ Li gorî encamên Lêkolînên Hêzkariya Zarokan a di sala 2006'an de li Tirkiyeyê hat pêkanîn, zarokên di navbera 6-17 salî ku bi awayekî aktîf dixebitin de ji sedî 41.1'î wan di çandiniyê de dixebitin.

✤ Li Tirkiyeyê di sala 2012'an de ji nav 893 hezar zarokên (6-18) ku di qada aboriyê de cih digirin ji sedî 44.68 di sektora çandiniyê de dixebitin. Di sektora çandiniyê de ji sedî 46.24 zarok wek karkera bêheq a malbatê dixebitin. Karkeriya bêheq a malbatî bi pileya ji sedî 92 şêweke xebata herî zêde ya derveyê qeydên îstîhdamê tên dîtin.

✤ Li Tirkiyeyê di sala 2019'an de ji 720 hezar zarokên (6-17) ku di nav faliyetên aboriyê de cih digirin, ji sedî 30.8'ê wan di sektora çandiniyê de dixebitin. Dema li gorî koma temeniyê bê lêkolînkirin; ji nav zarokên ku di navbera 5-14 salî de ne, ji sedî 64.1'ê wan di sektora çandiniyê de dixebitin. Ji sedî 34.3 ji van zarok perwerdeya xwe nadomînin û heftê 40 saetan zêdetir dixebitin. (TUÎK,2019)

*“JI BER DERBARÊ KARKERÊN ÇANDINÊ YA DEMSALÎ DEDANEYÊN ÎSTATÎKÎ NAYÊ GIRTIN, GUHERTINÊN LI GORÎ SALAN NAYÊN ŞOPANDIN.”*

⚠ Herî zêde zarok ji şert û mercên karkerên çandinî ya demsalî têde ne bi bandor dibin. Şertên bêtenduristî bandorê li ser pêşxistina zarokan dike û di encamên qezayên ku pêk tên de zarok birîndar dibin heta dimirin jî.

⚠ Zarokên ku di koçberiya çandinî ya demsalî de dixebitin berevajî hemsaliyên xwe ji perwerdeyê bê par dimînin.

⚠ Di salên 1990'î de li herêm Anatoliya Rojhilat û başûrêrojhilatê di encama valakirina gundan de keda zarokên çandinî ya demsalî derdikeve holê.

*“Xebatên kesên ku hîn 18 saliya xwe temam nekirine di hiqûqa netewî û navneteweyî de girêdayî gelek şertan e. Li Tirkiyeyê xebitandina zarokên ku hêj 15 saliya xwe tije nekiriye qedexe ye. Zarokên ku 14 saliya xwe tije kiriye bêyî ku bandorê hiş, exlaq û perwerdeya wê/î bike dikare di karên sivik de bixebite. Lê belê çawa ku ev qanûn di tu qadan de bi tu awayî nekete meriyetê, di karkerên çandinî ya demsalî de jî nayê pêkanîn.”*



Wêne: Ali Osman Abalı

⚠ Bêyî ku cudahî bixe, parastin û pêşxistina mafên zarokan ên wekî perwerde û tendurist yek jê berpirsyariya dewletê ye.

⚠ Li gorî agahiyên ku serokê Egîtîm-Sen a Rihayê daye Ajansa Mezopotamyayê, diyar kiribû ku li Rihayê nêzî 200 hezar xwendekarên karkerên çandinî ya demsalî heye.

⚠ Zarokên ku di çandekî cuda de mezin bûne, ji kurahî ve dij civakîbûnê dijîn û ev yek jî wan dike aliyên dezavantaj.

⚠ Di sala 2012'an de 354 zarok (Edene, Mêrsîn, Riha, Ordu û Yozgatê) tev li lêkolîna Atolyeya Pêşketinê bûn, li gorî vê yekê;



Wêne: Ali Osman Abalı

1. Ji van zarokan ji sedî 50.6 ji keç û ji sedî 49.4 jî ji kuran pêk tê.

2. Li Edene-Mêrsîn û Yozgatê tevlibûna zarokên keçan (ji sedî 54.5) ji ya zarokên kur (ji sedî 45.5) zêdetir e, lê li Rihayê rêjeya tevlibûna lêkolînê ya zarokên kur ji sedî 57.3 û ya zarokên keç jî ji sedî 42.7 e.

3. Hejmara zarokên nav malbatan kêmzêde 8.93 e. Ev kêmzêdebûn li Edene-Mêrsîê 9.4, li Orduyê 9.31, li Rihayê 8.35 û li Yozgatê jî 8.35 e. Hejmara kesên nav malbatê di navbera 4 û 28 kesan de diguhere.


Wêne: Ali Osman Abalı

**4.** Di nav bajarên ku zarok her demê dijîn Edene (4 zarok), Semsûr (38 zarok), Enqere ( yek zarok), Bêdlîs (yek zarok), Amed (3 zarok), Xarpetê (yek zarok), Dîlok (18 zarok), Meletî (yek zarok), Riha (272 zarok), Şirnex (11 zaroj) û Osmaniyeyê (3 zarok) cih digirin. Di navan de daneyê herî balkêş bi 272 zarokan yanî li hemû bajaran zarokên tev li bûne ji sedî 77'ê (ji 354 zarokan 272 zarok) wan di navenda Rihayê û navçeyên vê tev li koçberiya demsalî dibin.

**5.** Ji zarokên ku tev li lêkolînê bûn zimanê wan ên zikmakî ji sedî 7.4 tirkî, ji sedî 69.1 kurdî, ji sedî 14.9, ji sedî 3.2 zazakî (kirmackî) ye û di nav çar beşan de kom dibin.

**6.** Malbatên ku tev li koçberiya çandinî ya demsalî dibin di malên xwe de bi zimanên xwe yên zikmakî diaxivîn û bi taybetî aliyên kurd û ereb in. Îdiaya "xizanî bi etnîsîteyê re" yek jê îdiaya girîng a xizaniya nû pêk tîne. Daneyên lêkolînê van îdiayan piştrast dike. Aktorên xîzaniyên nû zarokên xizan ên etnîkî nin.

**7.** Li gorî taybetmendiya stargehan tê dîtin ku ji sedî 30.8 naylon yan jî konên bi qamîş, ji sedî 47.2 jî paç an jî di brandayan de dijîn. Xanî (ji sedî 5.4), ser banî (ji sedî 1.1), jîngehên prefabrîk (ji sedî 0.3) û ya din jî (ji sedî 16.1) şêweyên din ên stargehan pêk tînin.

**8.** Zarokên ku tev li lêkolînê bûn û bêyî astengiyek wan hebe diyarkirin ku pirgirêkên tenduristî yên wekî zekem (ji sedî 52.2), serêşandin (ji sedî 59.9), bi ser hişê xwe ve çûyîn (ji sedî 44.5), êşa piştan (ji sedî 48.7), ta (ji sedî 19.7) û dîzanteriyê (ji sedî 18.5) dijîn.

**9.** Ji sedî 56.9 zarokên ku nexweş dibin bi gumanên baş serî li navendên herî nêz a tendurîstiyên didin. Hat diyarkirin ku ji sedî 38.8 wan jî diçin nexweşxaneyên dewletê yên bajaran.

**10.** Ji sedî 35.6 zarokên ku tev li koçberiya çandinî ya demsalî bûne diyar kirin ku bi awayekî rêk û pêk parza bûne û ji sedî 54'ê wan jî diyar kirine ku bi awayekî rêk û pêk parza nebûne (Tablo 8). Rêje ku bi tu awayî parza nebûne jî ji sedî 9.3 ye.

**11.** Ji zarokan ji hezarî 3 di çar saliya xwe de, ji sedî 1.8 di pênc saliya xwe de, ji sedî 24.3 di şeş saliya xwe de, ji sedî 47.2 di heft saliya xwe de, ji sedî 15.8 di heşt saliya xwe de, ji sedî 8.2 di neh saliya xwe de, ji sedî 1.2 di deh saliya xwe de û ji hezarî 9 jî di yanzdeh saliya xwe de li dibistanê hatine qeydkirin.

**12.** Ji zarokên ku tev li koçberiya çandinî ya demsalî dibin ji sedî 73'ê wan dereng diçin dibistanê. Ji sedî 3 zarokên ku di navbera 6-14 saliyê de ne, bi tu awayî qeyda wan a dibistana seretayî tune ye. Ji nav zarokan 334 ji wan (ji sedî 94) di sala perwerdehiya dibistana seredayî ya sala 2010-2011'an de bi awayekî rêk û pêk neçûne dibistanê.

**13.** Di nav zarokên 82.8'an de beşek ji wan li ser pirsa 'ji bo neçûyî dibistanê re', berisva 'koçberiya çandinî ya demsalî' dane.

***Nîşe: sînora mekan û dem a vê lêkolînê bi giştî tevî ku zarokên karkerên çandinî yên demsalî nagire nav xwe, têkildarî şert û mercên ku zarok têde ne agahiyan dide.***



*Wêne: Ali Osman Abalı*





*Fotograf u Agahi: Atolyeya Peşketine*

***Hilberina titiine gelemperi wek pargidaniya malbati te kirin. Zarok ji di temene bifiik de bi malbate xwe re tev li hilberina titiine dibin. Berhevkirina pelen titiine dive yan bi şev an ji sere sibe zii were kirin.Ji ber ve yeke zarok ji bi şev tev li berhevkirina titiine dibin.***




*Fotograf u Agahi: Atolyeya Peşketine*

***U Eskişehire di hilberina pivazen hişk de rebaza heqdestiya li seri kiloyan, di palehiya gilyazan de rebaza yevmiye, di garisen de heiandi de ji li beramberi hilberine heqdestiya yevmiyeye te pekanin. Di dema pevajoya hilberandina pivaze hişk de hem ii ferden malbaten ku dikarin kar bikin, tev li dibin, ji ber ve yeke tevlibiina temene xebitandina zarokan dadikeve heta 5-6 saliyan.***




*Fotograf u Agahi: Atolyeya Peşketine*

***Di paleyiya findiqan de heqdestiya li ser kiloyan ii nivekari/şirikiye şeweyen dayine ne. Bi gelemperi zaroken ku bi yevmeyi dixebitin 7 4 ii ser 7 4 saliye ne, le te ditin ku zaroken di kare heqdestiya li ser kiloyan de dixebitin ji hin biçuktirin. Di nivekariye de ji ma/bat heya pekan e ji keda zarokan sûd werdigirin. Temene zaroken karkeren fandini ya demsali ya digerin di 7-8 saliya xwe de bi birina av ango barkirina few a/en val a destpe dike ii di 9-10 saliya xwe de ji bi paleyiya findiqan didome. Di heman deme de xwedikirina zaroken bifiik ii di karen male de alikaridayina ji dayiken xwe re ji kare din a zarokan e. Dema dikevin 11-12 saliyen xwe zarok weki mezinen xwe bi malbaten xwe re tev li paleyiya findiqan dibin. 0 zarok di temenen xwe yen 13-14 saliye de ji weki karker ten ditin.***




*Fotograf u Agahi: Atolyeya Peşketine*

***Riha ye ku ji sedi 40 pediviya hilberina pembiiye ya Tirkiyeye pek tine, her dife hem ji aliye hilberina pembiiye de hem ji ji aliye xebitandina pembiiye de dibe bajareke giring. Di palehiya pembii de li gori pergala qebalaye berhemen ku ten hilberinkirin gor miqtara we heqdeste we te diyarkirin. Ji aliye din berhema ku te hilberinkirin li gor miqtara we qomisyon te stendin. Destheqa qebaleye li gori lekdana miqtara berhema ku di dema paleyi de te komkirin ii bihaya ku ji bo we berheme hatiye diyarkirin, te hesabkirin. Di pergala komisyone de keda komkirina pembû ya di nav saleke de hemû aide simsar e û berhemen ku te komkirin ji sedi 30›e we wek berdela kare ku hatiye kirin te dayin. Di her du pergalen heqdayine de ji zarok wek karkeren belaş di hilberina pembû de cih digirin. Di vê pergalê de zarok hem di temenê hin bifiiktir de dest bi xebate dikin hem ji di şer û mercên hin xirabtir de dixebitin.***

## MEVSİMLİK TARIM İŞÇİLİĞİNDE KADIN OLMAK

✤ Li gorî Lêkolîna Hêzkar a di sala 2018'an ji aliyê TUÎK'ê ve hatiye kirin, ji sedî 42.5'ü a xebatkarên çandiniyê jin in û ji wan ji sedî 90 jî karkerê bêheq a malbatê tên dîtin.

> ***“ KARKERİYA ÇANDİNÎ YA DEMSALÎ, Dİ ŞERTÊN TİRKİYEYÊ DE ÇİQAS NEWEKHEV BİN KEDA KARKERÊN JİN ÊN ÇANDİNÎ JÎ EWQAS NEWEKHEV İN. ”***



*Wêne: Ali Osman Abalı*

✤ Di nav şert û mercên xizanî ya çandiniya demsalî de û di nav kevneşopiyên baviksalariyê de bûyîna zaroka keç, jinbûyîn, ji xebata nav zeviyan heta bikaranîna tuwaletê, ji kirina serşûştinê heta qeydkirina dibistan û dewamkirina perwerdeyê, ji ducanîbûyîn heta welidandinê her tişt zehmet e.

✤ Di nav karkeriya çandinî ya demsalî de jinbûyîn; di nav xizanî û tunebûnê de bi tunebûna malzemeyan çêkirina xwarin, bi tunebûna avê serşûştina zarokan û kirina paqijiyê ye.

✤ Jin tevî ji zarokên xwe re nikarin dem veqetînin, ger di nav malbatê de pitika muhtaç ango zarok hebe berpirsyariya xwedîkirina van an zarokên keç digirin ser milê xwe yan jî kesên pîr ku bi xwe re anîne (dapîr, bapîr) digire ser milê xwe.

## RÛ BI RÛ MAYÎNA JINAN A ŞERTÊN JIYANÊ KU HEMZAYENDA WAN DIMÎNE, NE QEDER E!

✤ Di karkeriya çandinî ya demsalî de jin hem bi mêran re di nav zeviyan de dixetin hem jî di konan de ji çêkirina xwarinê heta mezinkirina zarokan hemû karan dikin.

✤ Di karkeriya çandinî ya demsalî de mixabin ji konan heta cihên ku lê dijîn qadên jinan ên civakî tuneye.

✤ Di karkeriya çandinî ya demsalî de jin hinek caran ji aliyê mêrên li herêmên dixebitin de, hîn caran jî li heman qadên de rastî her cureyên tundiya mêran tên.

✤ Di karkeriya çandinî ya demsalî de rojane dema kirina xebatan 10-11 saet in lê jin bi kirina karên malê re rojane 18 saetan dixebitin.

✤ Jin li zeviyan tevî ku bi mêran re heman karî dikin ji ber sedema hegemonyaya baviksalariyê kêm heqdestiyê digirin.

✤ Ji sedî 76,6 jinên ser 18 saliyan ku di sala 2014'an de tev li lêkolîna Komeleya Piştgirî ya Jiyanê bibûn, xwendin û nivîsandinê nizanin.



*Wêne: Ali Osman Abalı*



*Wêne: Ali Osman Abalı*

## Dİ PANDEMÎNA COVİD-19'AN DE KARKERİYA ÇANDİNÎ YA DEMSALİYÊ

✤ Bi belavbûna pandemîna Covid-19 a li hemû cîhanê, hat dîtin ku aliyên herî dezavantajê ya ji pandemînê neyînî bandor bûn kedkar bû.

✤ Kampanyaya 'Li Malê Bimîne' ku li dijî pandemîna Covid-19 hat destpêkirin, karkerên çandinî ya demsalî ku ji neçarî dixebitin, tev li nebûn.

## GER HERKES Lİ MALÊ BİMÎNE DÊ KÎ MEHSÛLAN KOM BİKE!

✤ Karkerên çandinî yên demsalî her sal di meha nîsanê de diçin bajarên ku lê dixebitin. Ji ber hikûmeta AKP'ê rêwîtiyê girêdayî destûran kir, di serî de karkerên çandinî ya demsalî bû sedema astengiya rêwîtiyê.

> **"40 HEZAR KARKERÊN DEMASALÎ KU Jİ SALA 1992'YAN VE Jİ BO PALEYİYA ÇAYAN Jİ GURCİSTANÊ DİHATİN, Jİ BER GİRTİNA DERİYÊN SÎNORAN, PALEYİYA ÇAY Jİ KARKERÊN HERÊMÎ RE MAN."**

✤ Di 5'ê nîsana 2020'an de giştînameyeke zêde li ser biryara tevbirên qedexeya derketina derveya ya ji bo kesên binya 20 salî û ser 65 salî ku di 3'yê nîsana 2020'an ji aliyê Wezareta Navxweyî ve hatibû girtin, hatin zêdekirin;

✤ "Ji bo domdariya berhemên çandiniyê plansaziya navbera bajaran, şertên rêwîtî û bêhnvedanê… karkerên çandinî ya demsalî ya zagonê… dê ji qedexeya derketina derve mûaf bên girtin."

✤ Di 8'ê nîsana 2020'an de jî Walîtiya Ispartayê;

✤ "Di nav malbatên karkerên çandinî ya demsalî de zarok û kesên ku binya 20 salî dema di navbera cihê ku lê dimînin û bajarên ku lê dixebitin de bi malbatên xwe re rêwîtiyê bikin dê ji qedexeya derketina derve muaf bên girtin."

✤ Waliyên gelek bajarên wekî Riha û Çorumê giştînameyên ku karkerên demsalî ji qedexeya derketina derve û rêwîtiyê muaf in, parve kirin.

## KARKERÊN ÇANDİNÎ YA DEMSALÎ NEÇARÎ TÊN HİŞTİN KU NAVBERA VÎRUSA COVİD 19 Û ŞERTÊN JİYANA XİRAB DE TERCÎHEK BİKİN.

✤ Wezareta Daristan û Çandiniyê di mijara tedbîrên ku li dijî pandemîna Covid-19'an bê girtin de ji karkerên çandinî ya demsalî daxuyanî da. Lê mesafeya civakî dixwazî hebe dixwazî tunebe tişta heyî şert û mercên jiyan û xebatên karkeran gelek xirab e.

✤ Li holê ye ku hikûmeta AKP'ê ku pêdiviya mirovan a maske, test û dezenfekteyê pêşwazî nake, dê ya karkerên çandinî ya demsalî jî neke.

# PARTIYA DEMOKRATÎK A GELAN BI KARKERÊN ÇANDINÎ YA DEMSALÎ RE NE!

*Wekî Partiya Demokratîk a Gelan rêgeza wekheviyê rêgeza nebenabe ye. Bi tu awayî qebûlkirina şertên hilberînê ku keda karkerên çandinî ya demsalî nayê dîtin, ji aliyê çarçoveya rêgezên partiya me ve bêwate ye. Li Tirkiyeyê ji aliyê qanûnî ve neparastina mafên karkerên çandinî ya demsalî ku di pêşxistina sektora çandiniyê de kedeke wan a mezin heye, wekî nakokiyan nîşaneya neweheviyê ye. Ji aliyê mafê mirovan de tu wateya rojevbûyîna karkerên çandinî ya demsalî tenê her sal di qezayên trafîkê de, tuneye. Wekî Partiya Demokratîk a Gelan heta vê demê li gel kedkaran bûn dê ji vir şûn de jî di her şert û mercan de li gel karkerên çandinî ya demsalî bin. Di vê çarçoveyê de em ê dev ji têkoşîna gihiştina mafên karkerên çandinî ya demsalî ku ji tenduristî heta perwerdeyê, ji wekheviya zayendiya civakî heta mafê jiyanê ya zarokan, bernedin. Ji bo karkerên çandinî ya demsalî di nav şert û mercên jiyanî de bijîn pêşniyarên me ev in;*

**1.** Ji aliyê Wezareta Daristan û Çandiniyê ve divê li gorî bajaran di serî de nexşeya hejmara karkerên çandinî agahiyên mafên karkeran bên amadekirin.

**2.** Ji bo karkerên çandinî ya demsalî hilberîneke baş bikin û bi awayekî tenduristî biçin nav zeviyan divê ji gihandin heta stargehê, perwerde û tenduristiyê her merc bên avakirin.

**3.** Dema karkerên çandinî ya demsalî koçî bajarên ku lê dixebitin kirin, ji bo bi awayekî hişyenîk xwe bigihînin destûra seyahatê bên dayîn û ji bo pêkanîna koordînasyona navbera bajaran divê komîsyon bên avakirin.

**4.** Di qada çandiniyê de ji bo keda jinan bê dîtin, divê ji bo jinên kedkar ên çandiniyê ewlehiya zagonî û civakî bê avakirin.

**5.** Ji ber têkiliya xebatên jinên karker mafên wan ên sereke yên heqdestiyê bi awayekî wekhev bê dayîn.

**6.** Li her qadê de ji bo pêşîgirtina tundiya li ser jinên kedkar divê bi her awayî sererastkirin û mekanîzmayên qanûnî bên avakirin.

**7.** Derveyî çandiniyê divê saetên xebatên malê yan jinan jî li ber çavan bên girtin û bi karkerên mêr e bi awayekî wekhev bê sererastkirin.

**8.** Divê hemû cihêkariyên ku karkerên çandinî ya demsalî ku kurd û ereb in pêre rû bi rû dimînin, bên astengkirin.

**9.** Divê pêşî xebitandina zarokên binya 15 saliyê bê astengkirin û ji bo berdewamkirina perwerdeyê her şert bên avakirin.

**10.** Di pêvajoya hilberînê de ji bo kontrolkirin û venêrîna tenduristiyê ya karkerên çandinî ya demsalî ekîbên tenduristiyê bê avakirin.

**11.** Wesayîtîn ku karkerên çandinî ya demsaliyê bikar tînin bên kontrolkirin û ji bo pêşlêgirtina qezayên trafîkê jî her tedbîr bên girtin.

**12.** Divê heqdestên karkerên çandinî ya demsalê li gorî sazî û dezgeyên neteweyî û navneteweyî yên ku hatine diyarkirin, bên diyarkirin.

**13.** Divê hemû karkerên çandinî ya demsalê bikevin bin ewlehiya SSK'yê û bi vî awayî hem pêşî li îstîhdamê dij qanûnî bê girtin hem jî sererastkirinên ku ciwanên betal teşfîkê çewlikê dikin, bê kirin.



*Wêne: Ali Osman Abalı*

# SERERASTKİRİNA ŞERT Û MERCÊN KARKERÊN DEMSALÎ KU Jİ BER PANDEMÎNA COVİD 19 NEÇARÎ XEBİTÎN, PÊWÎST E.

**1.** Maliyetên jiyanî û seyahatên karkerên çandinî ya demsalî ku ji ber pandemîna Covid 19 zêde dibin, divê ji aliyê dewletê ve bê pêşwazîkirin.

**2.** Cihên ku karkerên çandinî ya demsalî lê dijîn li gorî astengkirina belavbûna Covid-19 bên avakirin.

**3.** Ji bo bicihanîna daxwazên karkerên çandinî ya demsaliyê mekanîzmayên sazmendî bên avakirin.

**4.** Ji bo bi awayekî tenduristî şopandina seyahatên karkerên çandinî ya demsalî ya di navbera zeviyan û cihên ku lê dijîn, koordînasyonên bajaran bên avakirin.

**5.** Ji bo jinûve diyarkirina qedexya derketina derve ya karkerên çandinî ya di binya 20 salî û 65 salî de, bi her awayî alîkarî bê dayîn.

**6.** Ji bo karkerên çandinî ya demsalî ku li zeviyan de dixebitin maske û malzemeyên hîjyenîk bên pêşwazîkirin û her roj bi awayekî rêk û pêk testa Covid 19 bi karkeran bê kirin.



*Wêne: Ali Osman Abalı*

**HDP Genel Merkez**
**Adres: Barbaros Mah. Büklüm Cad. No: 117 06680 Çankaya/Ankara**

@HDPgenelmerkezi
www.hdp.org.tr

PARTÎYA DEMOKRATÎK A GELAN